# Azadîa rastî çi ye?

Azadîa rastî ewe ye: heker em Xwidê nas kîn u guhê xu bidînê.
Xwidê dev yê daî ye me da em bişêîn xwarinê bixwîn.
Xwidê çav yêt daî ne me da em bişêîn dinyayê bibînîn.
Xwidê guh yêt daî ne me da em guh li hewa u baran u balinde u strangutin bîn.
Xwidê ezman yê daî ye me da em bişêîn li gel êk u dû biaxivîn u Xwidê bi rumet bikîn u da em li gel êk u dû ragehandin u aştî çêkîn.
Xwidê dest yêt daî ne me da em zeḫmetê bibîn da keyfa wî biêt, u da em tiştêt req u nerim u zivir u ḫilî yêt bu me çêkirîn pê şa bibîn.
Xwidê hizir u bîr daî ne me da em bişêîn karekî baş u taybet bi kar bînîn u da em bişêîn pirra ava bikîn u wêna dirist bikîn u kiras u fistana neqiş bikîn.
Xwidê hewes wekî yêt wî daî ne me da em bişêîn ḫes bikîn u bigirîn u kenîn u turre bibîn.
Xwidê hiş u bîr daî ne me da em bişêîn bixwînîn u binvîsîn u nîşa miruvêt dî her wesa bikîn.

Xwidê tiştêt baş daî ne me: xwarin u vexwarin, şîkirin, leş u pirrç yêt can, u dinya ya rengîn da lê bijîn. Xwidê cilkêt ‘ewilî çêkirîn (bu Ademî u Ḫewayê). Xwidê divêt em nuke bi çêkirina wî ya can şa bibînîn – ev ‘edire he ye – u piştî em dimirîn Xwidê divêt em bi esmane ya bu me ḫazir dikit. U ew esmane dê milyon cara cantir bit da em bizanîn.

Belê heker em bihêlîn devêt xu li axiftina turre u nexuş u xirab gendelî bibin …
Heker em devêt xu bi kar bînîn da zeḫf bixwîn, u vêca bibîn qelew (u vêca me seḫeta xirab hebit) …
Heker em bihêlîn çavêt xu seḫkinê tiştêt veşartî u taybet (u vêca ji nav da ya pir e ji talan u çav xirabê u ḫesidîê) …
Heker em bihêlîn guhêt xu guh li direwa bibin …
Heker em bihêlîn ezmanêt xu nifrîn li Xwidê u li miruva bikîn …
Heker em ezmanêt xu bi kar bînîn da biaxivîn u mendehuş bikîn, belê mebestêt baş kar bikîn da em li dîf şul u rengêt baş biçîn …
Heker em destêt xu bihêlîn tembel dibîn …
Heker em destêt xu bi kar bînîn destê xu bikin tiştêt veşartî u taybet (u vêca hewesêt me neraserbar bin) ...
Heker em bihêlîn hizir u bîrêt xu bikevine peî hizir (fantazîe; xêyal) ya gunnehbar …
Heker em bihêlîn hewesêt xu me ḫikmî bikin pêşve em hewesêt ḫikmî bikîn …
Heker em hiş u bîrêt xu pavêjîn u pêşve ramanêt gendelî bînîn …

… paşî me azadîa rast ya xu berze kir.

Rojî tiştek baş e. Belê heker rojî ya te bibit berîkanê da bibînit kî dişêt bi rojî bit bi dîarbînî u bi gîanî raman u hewes u hizir (fantazîe; xêyal) yêt gunnehbar hebit, ma bi rastî mebesta rojî temam bikit? Erê ne dirist e rojî ‘îbadetê kirin bu Xwidê?

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.